

Îran xwe ji bo
hev kêşeyên nû amade dike

»»» R:7



Qasimlo..! Simbola Xebata Kurdperweriyê ye

»»» R:3



Danûstandinên kurdî û hêviyên çaverêkirî

»»» R:4



Destê paşîn ya qumarek mezin û winda kirina du ser

»»» R:5



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (378) 22-07-2020 Buha (1000) Tûmen

Pûşper remza mana xwendingeha “Gelawêj”ê

2²ê Pûşpera îsal, 31 sal bi ser teror û şehîdkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat û rêberê me yê mezên re derbas bû.

Gelek caran hatiye gotin û tê gotin ku “Qasimlo di rêbaza xwe de zindî ye” û baştirîn belge bo îsbatkirina vê gotinê, vedigere bo berdewamiya rê û rêbaza wî, û hizrên wî ji aliyê Hêza Pêşmerge Kurdiştanê, û rêvîngên rêya wî di nav PDKÎ de, û ji vê jî zêdetir nîşandana emegdarî û wefadariya xelkê Kurdiştanê bi vî rêberê giranqedir. Lê pirsyar ev e ku Dr. Qasimlo çi di nav Partiya Demokrat de bi cih hêla ye, ku dikare îsbatkerê vê gotinê, û handerê berdewamiya rêvîngên rêbaza wî di nav vê rêxistinê de be? Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê li ser bingeha du stûnên sereke ava bûye, û xebat dike, ku gelek caran, wek pîrensîpên neguher ên hizbê tene hejmar; Ev jî pêk hatine ji netewexwazî û demokrasîyê! Peyama sereke ya PDKÎ nehêlana serkutkirina netewî ye, û heta nehêlana wê jî, ev gotar herwisa

wê bimîne, wate eva pîrensîpeke neguher e. Li dema afirandina wê heya niha em dibînin ku PDKÎ, rêberê wê, û tev endamên wê, bi dilsojiyeke bê hempa pabendê wê peyamê bûne, û eva ku hewce û li şiyana wê de bûye kiriye. Yek ji taybetmendiyan herî bilind ên Dr. Qasimloyê şehîd jî eve bû ku hertim û zêdetir ji her tiştî, bala xwe dida xelkê xwe, û tepeseriya xelkê xwe ji aliyê rejîman ve. Her lewma em dibînin berdewam li her cihî, û li navend û li nav leyîzên siyasî û civakî û akademî de, berdewam bal dikişande ser Kurdiştanê û pîrsa netewa Kurd. Ji wê demê ve ku bi awayekî micid tê nav meydana siyasî, û ji sekoya hizbeke diyarîkirî ve, li hewla bideştveanîna mafên gelê Kurd de ye, û radeya wê hogirî û bawermendiyê zêde dike, û hewl dide heta wî cihê ku îman hebe, xwe ji kok û bendên îdolojî ve dûr bigre, an jî hewl bide digel rewşa civakî û siyasî û çandî ya civatgeha Kurdiştanê biguncîne. Dr. Qasimlo bawerî bi vê yekê hebû ku dibe hizr û fikran digel taybetmendiyan civat-

geha me biguncîne, da ku bikarin bi baştirîn awayî bandorê danên. Emê di vir de herin ser behseke din, ku bo her tevgerê netewayetî gelek girîng e, ku di hizr û reftarên Dr. Qasimlo de jî gelek bi başî reng vedide, û bi hewl û têkoşîna xwe û hevberên xwe, ew yek kirine beşeke girîng ji reftarê siyasî û civakî a hizba xwe; Eve heman pîrensîpa duyem e ku me di destpêkê de îşare pê



kir. Di her tevgerê netewayetî de radeya beşdarên berfireh ji qat û texên civakî yên curbicur, girîngiyeke bingehî heye. Çimkî bi heman radeya ku, radeya beşdariyê zêde be, hem pêşveçûn û serketin misogertir û zêdetir e, û hem jî asoya pêkvejiyaneke aştiyane û aram rohtir, û aştiy civakî

û siyasî jî aramtir dibe, eva ji bilî vê ku nasnameya tevgera wê, ku wekî tevgerê netewayetî ye, naçe jêr pirsyarê. Ew erk jî bi wê bi vî awayî destber dibe, ku çend di nav wê tevgerê de takên civaka Kurdiştanê xwe dibînin, û çende rewşek amade ye ku wisa ji kesan nake ku heşt bi bihanîbûnê nekin. Ew yek girêdayî hem nebûna te`esuba hişk

(dugmbûnê) û hem jî hebûna demokrasîyê ye, û eva ku pêwendî bi behsa yekem ve heye, berê me bas kir, û ew hinda ku behsa duyemîn e jî, li hizir û reftarê Dr. Qasimlo de bi eşkere em dibînin, Dr. Qasimlo hertim behsa ezmûna demokrasîyê dikir, û li ser vê baweriyê bû ku em dibe demokrasîyê di nav xwe de

ezmûn bikin, da ku hêviyê bidin xelkê, ku em dikarin civakeke demokratîk ava bikin, û hem jî wisa bikin ku zêdetirîn rêjeya xelkê bi her bawerî û ol û mezhebekî ve be, cihê xwe di nav me de bibînin. Ev yek jî bixwe bihêzkirina demokrasîyê ye, çimkî banga hebûna demokrasî û bihevreyîyana aştiyane di wî cihî de piştraşt dike, ku derfetek bo derketin û bihevreyîyana rengên cuda hebe. Heta bawermendbûn bi demokrasîyê li hizra Qasimlo de hinde diçe pêş, ku xebateke serbixwe û cuda û azad dadinê. Ev yek heman dîtingeh e ku wekî mîrateke hizrî ji Qasimloyê mezin ve bo Partiya Demokrat bi cih maye, û niha jî li bereberê yad û bîranîna 75`emîn salvegera avakirina Hizba Pêşewa û Qasimlo û Şerefkendî de, em dibînin ku ev pîrensîpên neguher, her stûna sereke bo berdewamiya xebata mafxwazî ya hizb û gelê me ye. Ew xwendingeha berdewam e, û teji ye ji dersxwanên wefadar bi rêbaza sor ya şehîdan, û esmanê şîn ê hizra wan.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Cografîyaya siyasî a welatekî belalêdayî yê wekî Îranê, cografîyaya bi hev re jiyan û geşekirin nîne, belkî cografîyaya koloniyalîzmeke rîşedar e ku ne tenê hêzên desthiladar, belkî hizrên siyasî yên evên ku xwe bi nav û nîşaneyê navend pênase dikin dor girtine.

Koloniyalîzim, pêwendiyên siyasî û civakî û aboriyan di Îranê de pênase dike, û dîdgeha navendgera û navendnişînan bo netewên şemlêkirî, dîdgeheke koloniyalîstî bûye ku xwe ber bi navendê ve dibin û ên din jî dixin perawêzê.

Ew dîdgeha navend-perawêzî, wisa dike ku talankîrîna samana Kurdiştanê û Ehwez û Belûçîstan û Azerbaycan û Tirkemenîstan bo Farsan helal be, belkî bi awayekî ranegihandî û pêrewkirî di nav kûrahiya civatgehê de wisa derdixe ku du xwînên cuda hene: Xwîna Fars û navendnişînan û xwîna netewên bindest!

Di rojên derbasbûyî de Komara Îslamî li parêzgeha Urmiyê tawaneke zêde afirand û nemaze sê lawên Kurd îdam kirin ku yek ji wan bi tîrbaranê canê xwe ji dest da: Hidayet Ebdulahpûr, Sabir Şêx Ebdulah û Diyako Resûlzade.

Tenê tawana wan sê ciwanên Kurd ev bû ku Komara Îslamî bo veşartina şikestên xwe yên ewlehî hewceyî bi qurbanîyan hebû, û bi qur'ekêşiyê (şansî), navê wan sê ciwanên Kurd li du bûy-

Xwîna cuda

erên cuda di navbera çend salên cuda de derket. Wekî hertimî tohmata têkdana ewlehiya welat, û girêdayîbûna bi welatên bîhanî, ew cure tohmetane kirine stûyê wan de, û îdam kirin.

Lê civatgeha navendê! Qet di hember wan de dengê xwe bilind nekirin, û wekî bûyereke asayî lê mêze kirin. Heta di şiroveyên civaknasên wan de, û di ragehandinan de, basa vê yekê hate kirin ku wan du bûyeran ji hev cuda bikin, çimkî îdamkirina Kurdan hertimî hebûye û berde-wamiya pêvajoya berê ye! Belê îdamkirina Kurdan û kuştina Ereba û Belûç û sivakatîkirina bi Tirkan û Azeriyan di Îranê de asayî bûye. Her wekî çawa hemû rojekê roj ava dibe, û tarîfî tê, bi vî awayî jî zilm û ştema Navendê li dijî “perawêzê” (derveyî navendê) asayî bûye!!

Her di wan çend mehên derbasbûyî de rejîm bo tolhildana xwe li xwenîşanderên meha Xezelwerê di Îranê de, cezaya îdamkirina sê ciwanên Fars da. Tohemtên wan jî heman tohmet bûn: Têkdana ewlehiya welat û girêdayî welatên bîhanî.

Lê ya ku cuda bû, helwesta civaka Navendê! Bû. Kempênên cuda li dijî wî hikmî lidar xistin, û givaş bo hemû aliyekî anîn, ku di wê kempeynê de beşdar bin, û heta givaş bo hêz û aliyên “perawêzxiştî” (dûrxistî) wate netewên bindest jî anîn, ku ew hikmê îdamê şermezar bikin, lê di ragihandinên xwe de amade nebûn ku navekî ji sê lawên Kurd bînin ku hatibûn îdamkirin! Çimkî ji dîtingeha koloniyalîstî ve îdam kinceke bi bejn û balê Kurd û netewên bindest ve hatiye dûrin, û wisa dizanin ku tenê Kurd û netewên bindest dibe bête îdamkirin!



Ji dîtingeha koloniyalîzma rîşedar ve ew xwîna ku di nav regên mirovekî “perawêznişîn” (derveyî navendê) de digere, rijandina wê asayî ye, û xwîna takên ser bi navend û navendgerayî ku rengeke taybet heye, hekî dilopek ji wê xwînê birije xwarê, heram e!

Di cografîyayekê de ku du xwînên cuda hebe, û nirxa cuda bo xwînan danên, nikare berde-wam be, û tenê rêya berde-wamiya wê, ne tenê guherîna dem û çavê desthilatdaran e, belkî dakutana hizra koloniyalîstî ye.

Qasimlo..! Simbola Xebata Kurdperweriyê ye



N: Mihemd Hesko (hirasoz)

Her pêngavek berve
rewşenbîriyê, pêngaveke
berve azadiyê ye? Karl
Marks

Mixabin beriya çend rojan
salvegera şehîdkirina pêşeng
û kurdperwerê dilsoz Dr.
Ebdulrehman Qasimlo û
hevalên wî bû, ku li ser destê
neviyên dijmin û neyarên
mirovatiyê, zîlamên rejîma
faşîzima îslamiya Tehranê
û bi fermana rûpîs û rîq-
irêj Xumeynî yê xwînrij di
13.07.1989'an de li bajarê
Viyena paytexa welatê Nem-
sayê hatin terorkirin. Bi vê
yekê û bi vê kiriyara qirêj
ku dûr e ji hemû rewîştên
mirovî, dîsa û dîsa neviyên
çanda şovînizmê û ya hovîti-
yê nalên hovîtiya xwe biriqa-
ndin û kîna dilreşiya xwe bi
ser xweşmêrên kurdan de
rijandin!

Piştî ketina rejîma Şah
Pehlewî û serkeftina Xum-
eynî di sala 1979'an de, gelê
Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê
tûşî zordestiya neteweyî û
zordestiya rêolî (mezhebî)
bû, zordestiya rêolî diwartir
e jiber ku ew zordestî ji rêol-
angeran re pîroz dibînin, jiber
ku bi fetwaya Xumeynî bû
û têde dibêje ku, divê Kurd
werin kuştin. Di vir de gotina
"Can Misilî"yê Ferensî tê
bîra mirov ku dibêje: "Dawîn
Padîşah bi rûviyên dawîn
melle were bidarvebikin". Ji
ber ku herdu rejîman zoretî
û zordarî li Kurdan kirine û
ev fetwaya Xumeynî temiya
padîşahê Farisan Qembîz
kurê Koreş e ku di sala 522
b.z temiya xwe kiriye.
Mixabin, çiqas îro wek
duhînî ye, an duh jî wek îro
ye, her û her kînbarî, bê-
bextî û çavnebariya li hember

mafên gelê kurd û kesatî û serkirideyên Kurdan ne ji niha ve ye, lê belê ev hizra reş û şovînizm
ji serdema ketina Împaratoriya Mîdiya sala 550'î b.z û virde vedikşe û bi rengekî gellek zelal
di temiya Qembîz kurê Koreş padîşahê Farisan de xuya dibe, ev temiya Qembîz di sala 522 b.z
de û di dema ku ji şerê dijî welatê Misrê encamp dabû, vedigere û dema dighêje welatê Sûri-
yayê, nûçeya serkeftina kodetaya Mîdiyan bi serokatiya Gawamata dibhîse û Mîdî ji nûve bûne
padîşah, vê yekê kir ku Qembîz û tevî ku li ber mirinê bû, lê dîsa ji bêbextî kîndariya xwe nehat
xwar û têde daxawzê ji serkirideyên digel de dike ku, divê hûn nehêlibin Mîdî bibin padîşahê
we, û eger hûn bi vê yekê razî bibin hûnê heta heta birçî û stûxwar bijîn, eger na hûnê heta heta
dewlemend û kêfxweşî bijîn, û eger hûn temiya min bi cih nekin, wê nifir û niçîrên min heta
heta li we bibarin.

Min xweşt vê mînak bînim ziman daku vê yekê bêjim ku, du hezar û pêncsed sal in her û her
helwest û nerîna dijminên gelê Kurd nehatiye guhartin û her xebatkar an siyasetmedarekî dil-
sozê kurd wê bibe armanca tîrên wan. Pakrewan Dr. Qasimlo ku derçûyê dibiştana Pêşewa Qazî
Mihemed e, lawê rêbaza kurdperweriyê, xwendekarê dîroka bindestiya gelê xwe ye, lewra bû
kesatiyekî karîzmî ê berçav û bi şarezayî ya xwe roleke diplomasi a girîng li ser asta herêmî û



navdewletî dilîst û bi dilsozî û kurdperweriya xwe bû xwedî bandoreke mezin, ne tenê di nava
Partî Demokrat a Kurdiştana Îranê (P.D.K.Î) de, lê belê di civaka kurdî li Rojhilata Kurdiştanê
de bi taybetî û li nav gelê Kurd bi giştî, bi hizra xwe ya şoreşgêrî û riftar û rewîsta xwe ya
mirovhez û mirovdostî bû hêviyek di dilê gel de, bi xebata xwe ya kurdperwerî û bi tevgera xwe
ya bi dilsozî bo gelê Kurd û nerîn û şiroveyên zanistî û diruşt bû simbola kurdperweriyê û her-
wiha bû hilgirê alaya xebat û rêberê hemû têkoşerên gelê Kurd.

Ji ber van sedeman, nav û dengê Dr. Qasimlo tirseke mezin xistibû dilê dijmin û neyarên gelê
Kurd, jiber ku Xumeynî dît ku, ew tê risawkirin û bi rola Dr. Qasimlo heval û dostên gelê Kurd
zêde dibin û bextreşiya doza Kurd û bêbextî û rûreşiya rejîma Îslamiya Tehranê aşkere dibe û ji
ber serkeftin û destkeftinên ku Qasimlo bi destve tîne, vê yek kir ku Xumeynî û berdestên wî har
û çavsor bibin û pilana şehîdkirina Dr. Qasimlo dariştin û bi dek û dolab, bi xapan û xiniziyê
tawana xwe encamp dan. Lê bila tawankar baş bizanibin ku, neviyên Keyxwesrew, Gawamata,
Nehrî, Şêx Se'îd û Hefîd, pêşeng Qazî û Qasimlo wê pêbend bin bi pêvajoya azadiyê, wê hilg-
irê xetîrên rizgariyê bin û wê berdewam bin û wê serkêşiya karwanê qurbanîdanê ta roja felatê
bikin.

Almanya, 17.07.2020

Danûstandinên kurdî û hêviyên çaverêkirî



N: Zehra Ehmed Qasim

Danûstandin; bixwe huner û zanişt e, girêdana wê bi siyaseta, komelnasî, zimanzanî, derûnnasî û rêvebirinê ve heye, û ji destpêka dirokê peyda bûye û rêgirî li pêşiya şer û nakokiyên girtiye bi rêya diyalog û lihevkerinê, çareseriyên aştiyane hatine dîtîn, û bûye amrazek ji bo çareserkirina nakokiyên bi rêyên aştiyane û têgihîştinê di navbera aliyên dijber de. Pêvajoya danûstandinê li destpêkê bi diyalogê “hevpeyvîn” dest pê dibe, heta bi îmzekirina peymanekê bidawî dibe.

Hevdem ku çareserkirina nakokiyên bi şer û rêyên çekdarî dibin encama malwêranîyê û derdeseriyên mirovî, ji ber wiha Danûstandin ji hewldan û çalakiyên herî girîng in ji bo çareserkirina nakokiyên, û di vî serdemî de ev yek li bal hemû aliyên nakok û hevrik ve tê pesindkirin, û bûye alternatîfêk sereke ji bo çareserkirina nakokî, şer û hevrikiyê, ne-maze ku encamên wê li ser erdê baştirin ji encamên xirabiyên çareserkirina nakokiyên navdewletî bi şer û malwêranîyê, û ji ber vê yekê girîngiya diyalogê hatiye wekî take rê ji bo çareserkirina pirsgrêkên di navbera aliyên nakok de bi awayekê aştiyane.

Wek em dizanin ji berî damezrandina NY ku hêza leşkerî, herî rola xwe hebû di çareserkirina pirsgrêk û nakokiyên de û nîşana serweriyê bû, lê piştî peymana NY çareserkirina nakokiyên bi rêyên aştiyane ji aliyê hemû dewletên wê ve hate pesindkirin, ev yek di benda “6” birga “33”ya peymana NY de bi aşkere hat li jêr benda şeşan, birga 33 tê de

hatiye ku: “Divê aliyên nakok li destpêkê dest bi çareseriyên bikin bi rêya Danûstandin, lêpirsîn, navbeynkariyê û dadweriyê di dema ku berdewamiya nakokiyên wan bibin gef li ser ewlehî û paraştina navdewletî, yan hewl bidin ku wan çareser bikin, bi rêya sazî û dezgehên herêmî bi her rêyên aştiyane”.

Em di vê tekstê de girîngiya rola danûstandinê dibînin wek yekem pêngav ya aştiyane ji bo dîtina çareseriyên ji bo gelek pirsgrêkên civaka navnetewî. Têgeha Danûstandinê: Danûstandin: “Pêvajoyeke ku dibe di navbera du yan çend aliyan de, ku di nav wan de berjewendiyên hevbeş, cuda û dijber hene, ku ji bo bidestxistina encamên baş pêdiviya hemû aliyan bi tengkirina qada nakokî û cudabûnê û bi ferehkirina qada gengeşe, aqilmendî û têgihîştinê heye ji bo bigihîna rêkeftinê ji bal hemû aliyan ve bihête pejirandin.

Rewşa trajîk ya heyî li seranserê navçeyên Sûriyê ku gelê Sûriyê qurbanî û baca herî mezin dide



ji encama kirîza Sûriyê û destêwerdana dewletên herêmî û navdewletî, ku Sûriya bûye zemîna nakokiya berjewendiyên û qada bazarên siyasî, di dema ku nebûna yekrêziya kurdî û gotara siyasî ya kurdî dibe alikariya ji bo zêdekirina trajediyên gelê kurd li Kurdiştana Sûriyê, tevî ku sê rêkeftin ji bo yekrêziya mala Kurdî li Hewlêr û Duhokê a Kurdiştanê û di bin çavdêriya rêzdar Serok Mesûd Barzanî de hatine îmzekirin, lê ew hersê rêkeftin nehatin bicihkirin û li Qamişlo hatin betalkirin ji encama siyaseta takalî û ne pejirandina yektir.

Îro digel guhertinên girîng û peyabûna berjewendiyên hevbeş, careke din bal tê kişandin li ser pêwîstiya yekrêziya navmala kurdî bi rêya danûstandinê bi sponsoriya Amerîka û piştgiya Fransa di navbera her du aliyan kurdî de.

Hevdîtinên di navbera aliyên kurdî û sponsoran de bûn encama destpêkirina Danûstandinê raşterast, û yekem pêngav ji bo yekkirina gotara siyasî ya Kurdî ku bi yekem qonaxa wê hat navkirin di daxuyaniyek hevbeş di 16ê Hezîrana 2020 de li ser bingeha rêkeftina Duhokê hat ragihandin, ji bo destpêkirina qonaxa duyê, ber bi yekîtiyêke raşteqîn di hemû war û biyavan de. Berpirsariya dirokî tê xwestin ji herdu aliyan ku berjewendiyên netewî li ser berjewendiyên partîzanî bidin pêş û xebateke cidî ji bo çareserkirina xalên nakokiyê û hemû sedemên ne bicihkirina peymanên berê bikin ji bo peydakirina zemîneke guncayî di navbera her du aliyan de bi rêya danûstandinê li ser vê yekê, bi nehêlana nakokiyên û astengiyên navxweyî û herêmî ji bo rêkeftineke dirokî bibe havênê paraştina maf û berjewendiyên netewî yên Gelê Kurd. Niha tevî hemû astengî û nakokiyên ku amadekarî dibin ji bo destpêkirina gera duyê ya Danûstandinê Kurdî-Kurdî, ku serkeftina wê divegere bo cidiyeta her du aliyan û cidiyeta Amerîka, herwiha ku serkeftina wê, wê bibe faktor ji bo dîtina çareseriyê siyasî ji bo krîza Sûriyê li ser binyata biryarên navdewletî nemaze ya 2254, û peydabûna têkiliyên dostane di navbera opozisyona demokratxwaz de ya baweriyê bîne bi tebayî û yeksaniya mafên hemû netewên Sûriyê, helbet ku yekrêziya mala kurdî dê bibe derfet ji bo bihêzkerina aştiyê û pêkvejiyanê di navbera hemû pêkhatiyên civaka Sûriyê de.

Divê hemû alî girîngiya vê danûstandinê bizanibin ku çarenivîsa kurdiştana Sûriyê li ser vê yekê ye, ku serkeftin wê bibe kilîd ji bo çareserkirina doza kurdî û bidestxistina mafên netewî di paşeroj û destûra nû de, ku îro ji bo misogerkirina mafên gelê kurd û hebûna wê ti alternatîf li şûna rêkeftineke kurdî nînin û hemû çav li ragihandina wê ne.

Wergerandin: Ebdulezîz Qasim

Destê paşîn ya qumarek mezin û windakirina du ser



N: Elî Munezemî

Rejîma Îslamî a Îranê di heyamê wan çend salê derbasbûyî de, bi sedema dirêjîdan bi pîlanê xwe yê bo meyandina oranyomê û çêkirina çekên etomî, xwe êxsitiye rewşek dijwar ji aliyên aborî, siyasî û civakî ve. Ji ber wê yekê, rejîm di bin givaşa xurt ya derekî û navxweyî de ye. Bi sedema dûrketina Rojavayîyan li projeyên sermayeguzariyê di Îranê de, jêrxana aboriya welat pîrposekî bûye û li ber hev hilûşiyaye. Ev yekê rejîm neçar kiriye ku bera xwe bide Rojhelatê û di welatên wek Rûsiya û Çînê re zêdetir bikeve têkiliyên siyasî-aborî. Lê baca ku ew du welatane li rejîmê verdigrin bo wî karî, gelek buha û giran e; lê rejîm mecbûr e bo mana xwe, wê bacê bide. Jiber ku rewşa wê ne li navxwe û ne jî li derve rewşek baş nîne.

Lihevnezîkbûna Îranê bi Rûsiya û Çînê re piştî hatina serkar a «Trump» lezgîniyek zêdetir bi xwe ve dît. Di sala 2016an de derket ku Îranê piştî bexşîna pişkek zor ya deryaya Kaspîyê bi Rûsiyê, herwisa îzin daye wî welatî ku di esmanê Îranê re rakêtan bavêje Sûriyê û di binkeya balafirên şer a «Nûje» bo balafirên rûsî mifahê jê verbigrin. Lê ew puan di hember wan puanên ku Îran pê re mijûle ku bide Çînê, dixûye ku tiştek ne ew hinde mezin be. Karbideştên Îranê didin eyankirin ku xîmê wê belgeya pêwendiyên demdirêj, li dema seredana Serkomarê Çînê, «Xi Jinping», bo Îranê di sala 2016an û hevdîtina wî bi Elî Xamîneyî re, hatiye danîn.

Belgeya pêwendiyên di navbera Îran û Çînê de her çend bi fermî nehatiye belavkirin, lê di hindek rûpelên înternetî de belgeyek ku tevî 3 belgeyên havpêçe xwe li 18 rûpelan pêk tê, hatiye weşandin ku îdîa tê kirin ku ew sened e.

Ew belgeya han ku hêsta negihîştîye aşt li hev têgihîştinê û rêkevtin li ser nehatiye kirin, lê eger wek eva heyî were pejirandin, yê kartêkeriyek mezin çêbike li ser siyaseta navneteweyî, navçeyî di Rojhelata Navîn û di Îranê de. Ev yekê yê herwisa kartêkeriyek rasteraşt li ser pîrsa gelê kurd bi şeweyek nerênî hebe.

Di meydana siyaseta navneteweyî de:


Hikûmeta Çînê di sala 2013an de planek da nasandin ku bi «Kember-Rê» hatiye naskirin ku planeke bo saxkirina «rêka Hermûş» û rêya avî. Bi wê planê, Çîn dixwaze zêdetir li 60 welatên cîhanê di Asiya, Afrîqa û Ewropayê de, bi rêka avî û ya hişkatiyê bi hev re bide girêdan. Heke ew plan cih bigre, yê Çîn di warê leşkerî, aborî û siyasî de yê bibe cemserek girîng di cîhanê de.

Çima Îran tevî wê planê ye çi bi dest dixê çi li dest dide? Jiber ku Îran ji aliyê welatên Rojavayî ve li ber reftarên şaş, pişgirî li terorîsmê û meyandina oranyomê bo çêkirina çekên etomî, ji aliyê aborî ve hatiye dorpêçkirin û tehrîm li ser de hatine sepanandin, kompaniyayên Rojavayî di Îranê de sermayeguzarî nakin û vê yekê jêrxanên Îranê jiberhev belav kiriye û peritandîye, aboriya wê bi yekcarî hatiye herifandin û Îran çiyê din nikare li ser piyê xwe bisekine. Aşt hejariya xelkê bi awayeke bêhempa bilind bûye û xelk nikare debara xwe bike û li nebûna azadiyê de, ew bi yekcarî li rejîmê bêzarîn. Îran herwisa bo ragirtina hevpeyamnê xwe yê wek rêkxistina terorîstî a

Hilzulla û Hemas û ...hwd neçar maye di rewşek pir lawaz de tevî wê planê bibe ku bikare heyamek din jî li temenê xwe dirêj bike. Lê ev yekê di pêşerojê de bi zerera xelkê Îranê û xelkên bindestên Îranê ye û yê di dawiyê de jî dîsa serê rejîmê jî bixwe.

Îran yê gor wê peymanê (eger bê pejirandin) yê bibe welatek qerdar. Kompanyayên Çînê yê bê rikeber di hemû waran de bo sermayeguzariyê bêne meydane: Pîşesaziya petrol û gaz, derêxistina kangayên jêrd, petrokîmiyayî, vizeya navikî, elektrîk, av, çêkirina rêkên mezin û xetê hesin û veguheştina deryayî, torîzm, hevkarîyên bankî, zanişt û perwerdeya hêza mirovî û ... hwd.

Herwisa ji aliyên leşkerî, perwerdeya hêzên çekdar, sîxurî û ewlehiya înternetê ve jî qirare ku Çîn hevkarîya rejîmê bike. Ew hazirin ku ji aliyê siyasî ve jî li ser pîrsên navneteweyî û herêmî piştgiriya helwêsta hevûdu



bikin. Ev yekê xûyaye ku rejîmê hewceyî bi piştgiriya Çînê heye heta ku Çînê piştgiriya rejîma terorîstî hewce be.

Çîn qirar e di warê berhemên bo saxlemiyê (dermanî), werzêrî û pîşesazî de hevkarîya Îranê bike û jêrxanên deryayî û hevayiyê Îranê jî nûjen bike.

Herwisa qirar e ku Çîn di çêkirina bajarên nû, bi xasma çêkirina bajarên li çola Tebe-sê de hevkar bike û pişkek li wan bajarên ku qirare

çêbikin, li ber kompaniyayên Çînî dikeve. Qirar e ku ew petrol û gaza ku li Îranê û Îraqê berhemtînin, li rêka Pakîstanê re bişînin bo Pakîstan û Çînê bo dabînkirina vizeya ku Çînê pêwîst e. (Ew yekê armanca Îranê li plana girtina Kerkûkê de zêdetir derdixe).

Çîn dixwaze ji rêka Îranê ve bi çêkirina rêka hesin li bendera Çabehar bo Asiyaya navîn û li bendera Çabehar û bender Ebbasê bo Tirkîye û Azerbaycanê, hêsantir bigîje wan bazara Ewro-Asiya û Ewropa. Wan herwisa plan hene ku bi rêka hesin, Îran, Îraq, Sûriye û Pakîstanê (Nîvheyva Şîe) bi hev re girêbidin.

Ev yekê bi kurtasiya wan xalan e ku di wê belgeyê de hene. Ez baver im ku eger raştiya belgeyan derbikeve, hêsta zêdetir jî rejîmê puan dane Çînê.

Kartêkeriya wê planê li ser Kurdiştanê:

Eger ew plana serbikeve,

yê kartêkeriyek rasteraşt li ser meseleya kurd li her çar perçeyên welat de hebe. Kurdiştan semxatirê rewşa xwe ya erdnigarî ku Asiya bi Rojhelata Navîn, Ewro-Asiya û Ewropa ve girê dide, di wê plana Çîn û Îranê de xwediyê girîngiyek xasmanî ye. Her guhertinek di erdnigariya siyasî a Îran, Tirkîye, Îraq û Sûriyê de hebe, yê wê planê bo yek yan çend aliyan têk bide û ew yekê jî bi dilê wan nabe.

»»» Doma R:5

Lê kurd dikarin li rikeberiya navbera welatên din yê zilhêz tevî Çîn û Îranê bo berjewendiya xwe mifahê werbigrin.

Encam:

Îran bi wê rejîma terorîstî ku îro welat bi rê ve dibe, li hemû warên siyasetên xwe yê aborî û civakî hukumdariyê îflas kiriye. Ew belgeya ku tevî Çînê amade kirinî û qirar e bibe bingeş bo hevpeymaniya wan bi hev re, yê Îranê bike welatek qerdar û welatek ku di hemû meydanên wê de Çînî xwediyê biryar û gotina yekem û dawî be. Bi wê hindê hemû çavkaniyên girîng yê aborî wek petrol, gaz, sîstema dirav û bankî, rêkên deryayî, hişkati û hewayî, siyaseta derve, ewlehî, hêzên çekdar ...hwd dikevin bin sîbera biryar û siyasetên welatê Çînê. Îran dibe koloniyek nû û ew yek jî yê jiyana hemû xelkê di Îranê yan di bindestê Îranê de û ew welatên ku Îran biryara wan ya siyasî dide (Îraq, Sûriye, Yemen, Lubnan) yê tûşî rojên reştir bin. Em wek gelê kurd nabe îznê bidin ku ewên nûnerê rastî yê gelê me ninin, hanekî bi sade hemû çavkanî û kangayên welatê me bo çend salek desthilatdariya xwe herac bikin û em xwe di pêşerojê de beramber wan rêkevtin û peymanan berpirsiyar nizanin.

Êrîşa bi bêdengî



N: Nûredîn Sofîzade

Rejîma Îslamî ya Îranê 4 dehik e ku berdewam pê silogana “Merg Ber Amerîka û Merg Ber Îsrail”, guhê cîhanê kerr kiriye û gelek caran deshilatdarên wê rejîmê, gefa ji ortêhilîna bi yekcarî ya Îsrail li ser xaliya erdê xwarine.

Lê ger mirov dênê bide cudahiya di navbera gotin û kiryarên wê rejîmê de, gelek bi başî xuya dibe ku ew siloganên rejîmê û bidijmin hesipandina Amerîka û Îsrail, tenê çekirina dijminê xeyalî bûye û tenê ew silogan ji bona xapandina xelkê sava û “mesrefa” hundirî bûye. Hekî em derbên giran û xisara malî û mirovî ya rejîma Îranê di derveyê sinorên Îranê berçav bigrin, bi taybetî di wan çend salên wê dawiyê de, ew derbên ku Îsrail bi êşkera li Sûriyê de ji hêz û binkeyên rejîma Îranê danî, heya niha rejîma Îranê ne tenê çî bertekê tine bûye, belkî amade nebûye bas jî bike.

Gorî hin jêderan û gorî wan hemû cinazên kuştîyên rejîmê, li jêr navê “Parêzerê Herem li Sûriyê” ve bo Îranê tene veguhestin, heya niha pitir ji 2 hezar û 500 kes ji endamên Spaha terorîstî ya Paştaran û hêzên Îranê li Sûriyê de, rastewxwe ji aliyê Îsrail ve hatine kuştin, û bayê milyardan Dolar, çek

û cebilxane û alavên şer yê Îranê ji aliyê balafirên Îsrail ve hatine bombabarankirin û ji nav çûne.

Ku wisa ye rejîma Îranê amade nîne ne wan xisarên xwe mediyayî bike û ne jî dikare di hember êrîşên Îsrail de bersivê bide û şer bike, xuya dibe ku siloganên wê rejîmê li dijî Îsrailê, tenê û tenê bo xerca navxweyî ne û tenê dixwaze xelkê Îranê bixapîne, hekîne çî pê çê nabe. Niha mesele gelek ji vê hindê jî derbas bûye û lêdana ji hêz û navendên heştîyar û girîng ên rejîma Îranê tenê di Sûriyê de nine, belkî di destpêka Tîrmehê ve, Îsrailê her şewê navendeke girîng a Îranê dike armanca êrîşa xwe û ji nav dibe, bo mîna dikarim îşarê bi wan cihan bikim: “Navenda Mûşekî li Perdîs a Tehranê, Padigana Perwerde ya Spaha Quds di navbera Tehran û Kerecê de, Weşartingeha Mûşekî di Seed Abad a Mêşhedê, Binkê Vizegeha Navikî ya Netenzê, Karxana çekirina Belemên Spahê li Bûşêhrê, û çendîn karxanên mezin ku jînavçûna wan hinde dinê pişt a aboriya rejîmê şikan”.

Herwekî çawan rejîm li hember êrîşên Îsrailî li Sûriyê de bo ser hêzên xwe, xwe bêdeng kiriye, di hember wan êrîşan de jî herwisa bêdeng e û amade nine raştîyan û xisaran bas bike, êrîşên Îsrailê bi piştevaniya Amerîka hinde eşkerene û di demekê de ku gelek jêder bas dikin ku ew êrîş ji aliyê Îsrailê ve tene kirin, heya niha deshilatdarên Îsrailê ev yeke red nekirine. Ne tenê red nekirine, berî destpêkirina wan êrîşan, Îsrailê ragihand ku dê êrîşê bike ser Îranê û Amerîka jî bi êşkera piştevaniya xwe bo

êrîşan ragihand.

Pirsyar ev e ku erê gelo rejîma Îranê çima basê wan êrîşan nake û çima bi çekirina hinek sinariyoyên weke agir berdana hinek cihan, cehdê dike ku raştîya wan êrîşan weşêre û perdepoş bike?

Bi raya min bersiv gelek xuya ye ku çiyê.

1- Di demekê de ku bi hegera şiltaxî û tedexula rejîma Îranê di nava karê welatan de, deshilatdarên rejîma Îranê gelek baş dizanin ku yekdengiyekî berfireh heye li dijî Îranê û hekî şerekê digel Îsrailê bi êşkera bike, ne tenê ti welatek pişa Îranê nagirin,



belkî dê cehdê bikin ku ew rejîm ji nav biçe û nemîne. 2- Di demekê de ku bi hegera siyaseta şerxwazane ya wê rejîmê, çendîn dorpêçên aborî li warê çek û cebilxanan ve li ser Îranê ne û piraniya alavên şer her ji balafir û tankan ve bigre heya digîje top û çekan, yan hinde kevin û rizî bûne ji kar ketine û şiyana bikar anîna şer çînînin, yan jî hekî şer eşker bibe û rejîm destpê bike, tenê bo demekî kurt nikare li hember alavên herî modern ên şer û teknolojiya herî pêşkevî ya Îsrailê, berevaniyê bike.

3- Di demekê de ku bi hegera dorpêçên aborî li ser Îranê, sîstema ekonomiya welat

bi temamî herifiye, giranî, bêkarî, bêdahatî di Îranê de bêdadiyê dike, bi taybetî êdî rejîm nikare heqdest û hiquqê karmend û persênula birêveberiya welat bide û xezîneya welat xir û xaliye, bi wê rewşa aborî tenê nikare bo demê çend rojan jî li halê şer de xwe îdare bike.

4- Di demekê de ku xelkê rojreş ên Îranê benda derfetekê ne ku bikarin bona xelasbûn li jêr zilm û zordarî û sêdare, îşkence, girtin, bê mafî, tepeserî, nebûna azadiya siyasî, civakî, netewî, olî, qatî û yêr dinê, wê rejîmê sernixûn bikin û ji ortê hilînin, hekî rejîm êrîşa Îs-

raîlê bo ser Îranê eşker bike, renga xelkê bêzarbûyî yê Îranê jî wê yekê bi derfet bizanin, û hevdem digel givaş û êrîşa derekî bo ser rejîmê, ev jî serhildana xwe ya herî dawî û çarenivîssaz dest pê bikin û gelek bi lez rejîm sernixûn be.

Belê ew sedemên eşkerenekirin û weşartina wan êrîşane, lê heya kengê dê bikare xw bigre û hekî êrîşa derekî jî nebe, bê guman xelkê Îranê di demeke gelek nêzîk de, text û bextê wê rejîma dijî mirov tev bipêçin û sernixûn bikin û bigîjne jiyaneke pir serweriyane û jêhatiyê mirovê pêşkevî yê cîhanê.

Nerîna Lîderan



“Brian Hook”:
“Em nearamiyên berfireh di Îranê de dibînin”.



“Edy Cohen”:
“Kurd û Ereba amadeyê bûyereke girîng bin di Îranê de”.



Bijen Zengene:
“Ti welatek amade nîne ku digel me girêbestan wajo bike”.



“Gabi Ashkenazi”:
“Ewropa û cîhan dibe pêşiya etomîbûna rejîma Îranê bigrin”.

Îran xwe ji bo hevkeşeyên nû amade dike

N: Eskender Ceiferî

Edy Cohen rojnamevan û mamosteya zanîngehên Îsraîlê di Twitterê de ragihand ku hevkeşe û guhertinên mezin wê çê bibin û pêwîst e Kurd li Kurdistana Îranê û Ereba El-Ehwazê xwe amade bikin.

Îran jî bi hewlan ketiye bizane çî diqewme. Ji ber ku ew, vî mamosteyî wek sîxurê Îsraîlê binav dikan.

Hevdem Donald Trump serokkomarê Dewletên Yekbuyî yê Amerîkayê jî di hevpeyvînekê de ligel CNN ragihand ku wê di 8 heftiyên bê de guhertinên mezin pêk bên ku kes li benda wan guhertinan nebûye.

Niha jî êdî Îran xwe ji bo qonaxa nû amade dike.

Beriya 3 salan jî rewş wek niha bû. Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê ragihandibû eger bedêleke baştir hebe, ewê referandûma serxwebûna Kurdistanê ya 25'ê Îlonê lipaş bixin. Ji vê referandûmê re ti bedêlek nehatin pêşniyarkirin ku bi dilê berpirsên Kurd be lewma jî Kurdan referandûm kirin.

Wezîrên derve yê welatên Iraq, Tîrkiye û Îranê li ser mijara referandûma serxwebûna Kurdistanê, daxuyaniyeke hevpar dabûn û teqez kiribûn ku her sê alî referandûmê red dikan û li gor wan, divê yekperçeyiya Iraqê bê parastin. Di daxuyaniyê de ti gef li Herêma Kurdistanê nehatibûne xwarin lê îdia hatibû kirin ku wê referandûm, hemû destkeft û serkeftinên Iraqê di warê şerê terorê de bixwe metirsiyê û wê gelek pîrsgirêkên din li navçeya Rojhilata Navîn derxîne. Ji civaka navdewletî jî xwestibûn pêdaçûnê di prosejê de bike û pêwîst zanîbûn di çarçoveya destûrê de pîrsgirêkên Hewlêr û Bexdayê bêne çareserkin. Niha jî heman rewş e. Bi belavbûna behsa guhertinan, Mihemedcewad Zerîf wezîrê

derve yê rejîma Îranê serdana Hewlêr û Bexdayê dike. Dema referandûmê, heya dema dawiyê jî çavên Komara Îslamî li Yekîtiya Nîştîmanî ya Kurdistanê û aliyên nêzikî Partiya Karkerên Kurdistanê bû ku astengiyan ji referandûmê re çê kin. Lê berpirsên wan partiyên bi hemû hêza xwe piştgiyê didin referandûmê. Kongireya Civaka Demokratîk KCD di encamnameya kongireya xwe de got ku ew hevkarê xelkê Başûrê Kurdistanê ne û dewletên ku gef li Herêma Kurdistanê xwarine, bi tundî şermazar dikan û li gor baweriya wan, di encama referandûmê de, wê xelkê Başûrê Kurdistanê viyan û biryareke xurt nîşan bide ku di xizmeta yekîtiya netewî de be.

Rejîma Tehranê dizane bê guman eger guhertin çê bibin, wê para Kurdan jî hebe. Lewma jî li ber deriyê Kurdan digerin. Dema referandûmê, tiştên ku rejîma Îranê tirsandibû, hevgirtina Kurdan bû. HDP çendî caran ragihandibû ku mîna gelên hemû cîhanê, Kurd jî dikarin mafê xwe yê çarenivîsê bi dest bixînelin û ev mafekî rewa û siruştî ye û ew weke HDP piştgiyê didin referandûmê. Lê Îran jî piştgiyê navdewletî nîgiran bû û ragihandibû ku rêkeftineke veşartî jî bo piştevaniya serxwebûna Kurdan heye. Di demekê de ku Washington û hin welatên Ewropî, Tîrkiye û Îranê neyariya xwe ji referandûma serxwebûna Kurdistanê re nîşan danbûn, lê Rûsiye ku hevpeymana Îranê ye jî, bi rengekî din tevdiageriya û kompanyaya Rûsneft ya Rûsî çend rojan berî dema birêvebirina referandûmê, nûtirîn projeya xwe derxist û ew jî wek hevkarîyekê ji bo Herêma Kurdistanê bi armanca pêşxistina pêşesaziya gaza siruştî jî bo herêmê û şandina derve binav kir. Her wek çawan ku niha Kurd li benda guhertinan in, çavên wan li sîyasetvanên navdewletî ye jî. Kesên wek

Bernard Kouchner jî bo wan gelek girîng in. Bernard Kouchner wezîrê berê yê Derve yê Frensayê ragihandibû ku her kes mifahê ji Kurdan distîne lê naxwazî gelê Kurd serxwebûna xwe rabigehîne. Got jî pêwîst e piştevaniya wan bê kirin. Partiya Sosyal Demokrat a Swedê ku desthelatdariya wî welatî dikir, piştevaniya referandûma serxwebûna Kurdistanê kiribû û Anders Österberg, perlemanterê vî partiyê û endamê komisyona derve ya Parlamentoya Swedê gotibû ew piştevaniya encamdana referandûmê li Kurdistanê dikan. Dewleta ku herî zêde Îran jê aciz e, Îsraîl e ku beriya hemû dewletan bi awayekî eşkere ragihandibû ku ew piştgiyê didin dewletbûna Kurdan.

Bê guman kiyana serbixwe ya Kurdan, çî li başur yan jî li rojhilat, bo Îranê her metirsî ye. Ji bilî vê, 33 perlementerên Yekîtiya Ewropayê jî piştevaniya xwe ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê ragihandibûn û vî mijarê jî nîşanî Îranê daye ku Kurd dikarin piştevaniya navdewletî bi dest xwe ve bînin. Hevdem Qasim Sulêmanî tîrorîstê Sipaya Quds ya Îranê ku niha hatiye kuştin, jî bo poşmankirina Kurdan ji encamdana referandûmê, hewlên xwe xurt kiribû û hin hevdîtin jî bi YNK'ê re pêk anîbûn lê Necmedîn Kerîm parêzgarê Kerkûkê û endamê Encûmena Bilind ya Referandûmê dabû xuyakirin ku li gor YNK'ê, tenê bi serxwebûn û azadiyê wê pîrsgirêk çareser bibin. Raşt e eger 16'ê Oktobêrê tîne bûya, niha ew serbixwe bûn. Lê dîsa jî dîrokê referandûm nivîsandîye û Îran jî hertim jî van egeran ditirse. Xuya bû ku bi encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê tevî hemû guvaşên navdewletî, Îran jî berê goşegirtir bû û niha jî bi van gotinên Trump, divê xwe ji guhertina hevkeşeyên navçeyê re amade bike.

Keniya Dr. Qasimlo û faşizma Xomêynî



N: Emer Koçerî


Di dîroka millet û gelan de, car mirovên bêhempa derdikevin ku wêneyê milletê xwe bi tîpên zêrîn dinvîsin û sax di dîrokê de dimînin, û goman tê de nîne ku Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê, yek ji gîrgire û mezinê netewa Kurd ye, ku digel hevalên xwe hat şehîdkirin di rojê reş de li Viyêna, paytexta bêwijdan û çavtirs ji cînatetkarên xwînî!! Şehîd Qasimlo dikarîbû xwendina xwe li Parîsê berdewam bike, û tevî xwepêşandana li dijî Şahî Îranê nebe, û dikarî berdewam sûd ji dewleta Îranê wergire û ji xweşiya Ewropî wek profesorekî zanîngehê derkeve, lê wî berjewendiya gelê xwe yê bindest li ser berjewendiya xwe ya kesayetî girt, û ji bo gaziya kurdên Rojhilatê Kurdistanê û hawara gelê xwe yê birîndar bi xwedan derket û dest ji xweşiya Ewropa û ji zanîngeha herî bilind berda, û razî bû ku di nav şikeft û çiyayên kurdiştanê de û di nav baz û pêşmerge qehreman de bijî ji bo siberojê geş ji bo gelê xwe yê bindest.

Erê; Qasimlo dizanî ku Ewropa welatek xweş e... Lê eşqa ji bo welat gerimtir bûbi erkê xwe dizanî ku biçe bi hawar û gaziya gelê xwe ve, dizanî ku dibe şahîd bibe, çend ku şehîdbûn li pêxema azadiya kurdiştanê bi xwe şanazî û rûmeteke herî mezin e. Qasimlo dizanî ku dijmin çend çavtirs û tirsonek e !! Kenê wî hêrsa wî bû, û çend hêrsa wî zêde dibû, dikenî, bi kenê xwe sehim dixiştê dilê dijminê xwe de, û pozbilindiya wî dişikand. Jiber ku Qasimlo qehreman bû, bi

tevî dilê xwe yê spî wekî dilên hemû mirovên kurd û qaşo li welatekî “demokratîk”, çû ji bo ku mafên gelê xwe bi pênivîs û kaxezê li ser maseya diyalogê biştîne. Şehîd bi kenê xwe navdar bû, yê di serdema xwe de bi rûyê xwe yê geş û biken karî li ser Şahê Îranê serbikeve dema ku Frnasa derket di sala 1948’an de, ta dema faşizma Xomînî, yê şerê qirkirinê li dijî Kurdan ragihandibû.

Girnijîn û kenîn, tivinga li milê Profesor Qasimlo bû, lê xedir û xiyaret herdem û li her deverê ji dijminan xilas nabe, herdem cînatetkar in û nayên guhertin, ew tenê bi kuştinê her dengekî raştîyê bêdeng dikan ... Çend wê xweş be ku hindik hişiyarî digel kenê profesor hebe, hindekî li jiyana xwe miqate be, ji ber jiyana wî bo me pêdivî bû, xwezî digel rejîma Îranê ne di danûstendinan be, ku dikarî digel rejîma cînatetkar amade nebe, her çend ku şanda Îranê şandek bilind nebû.

Qasimlo, dizanî ku ken di rûyên dijminan de bêhude û bêmifa ye!! Raşt e Qasimlo şehîd bû û jiyana xwe ji dest da, lê kenê wî hêj dimîne, û dê serbikeve li rûreşên serşor û tirsonek... Raşt e ku îstixbarata Îranî her piştî Qasimlo karîna careke din destê xwe dirêj bikin, Dr. Sadiq Şerefkendî



jî li Berlînê di 17’ê êlûna 1992’ an de şehîd bikin, lê dilê gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê her maye ew dil ku ji bo berxwedan û azadiyê lêdide, li dijî Faşizma Xomînî, tevî hovîtî û dirindetiya wê û berdewamiya wê li ser rijandina xwîna gelên Îranî, bi serkutkirin û kuştin û darvekirina bi hezaran keç û kurên rojhilat, lê berxwedana Rojhilat berdewam e, wekî kenîna Qasimlo, ku wê serbikeve û bibe nifret li rejîma cînatetkar û dê wê ber bi zewal û nemanê bibe.

1-Emer koçerî, sernivîserê rojnama kurdiştan e, û endamê komîta navendî ya PDK-S ye



Dêje “Şuma” Farsî Nizanî



N: Serbest Urmîye

Di çend rojrên borî de vîdiyoyek ji dayîkeke Kurd li herêma parêzgeha Urmîyê li ser torên civakî hate weşandin. Di vê vîdiyoyê de dayîka Kurd hewil dide ku bi zimanê Farsî pêwendiyê telefonî bi keseke/a Fars ziman ve bigire. Lê ji ber ku şarezayîya wê bi zimanê Farsî re çî nine, pêwendiya wê tevliheviyek ji herdu zimanên Kurdî û Farsî ye. Reng e ji aliyê gellek kesan ve ji bo pêkenîn û derbaskirina demê ev vîdiyo hatibe weşandin. Renge jî hin ji temaşevanên vê, nemaze temaşevanên Fars, weke kêmasî yan xebûneteke mezin jê mêze kin. Lê di raştî de peyameke gellek cidî di vê vîdiyoyê de heye ku xebûneta wê ne ji bo gelê Kurd e, lê ev şivikeke bihêz e bo ser hizra wan ên ku eva bi sed salan e hewil didin bi zext û zoriyê neteweyêke çine û çinebûyî biafrîn. Erê neteweya dseştçêkirî ya Îranî û zimanê neteweyî ya Farsî. Di raştî de ev vîdiyoya han hemû hewilên faşizma Fars tune dike û ji hin aliyan ve cihê têrman û hizirîne ye. yekem, di warê serhildana hizir û cî bi cî kirina sîstema dewlet – neteweyî di Îranê de. Bi eşkere tunekirina dewlet-netewebûnê û pûçkirina pirojeya cêkirina dewlet-neteweyêke bê bingehe li ser navê dewlet-neteweya Îranê tîne ziman ku di heyamê deştêpêkirina deştîlata Rîza Şahê Pehlewî de deştêpê hatiye kirin û di pêxema serxistina vê pirojeya bê wate de heya îro, eva sed sal e ku berxwedana hemû gelên ne Fars di çarçoveya cografî ya ku îro bi Îran tê nasandin de, bi xwîna wan a sor hatiye rengkirin. Duhem, ev dayîka Kurd peyama tunebûn û

sernekewtina pirojeya sepandina zimanê neteweyî yê Farsî dide ku hemû hewil hatiye dayîn weke zimanê neteweya deştçêkirî were sepandin û bibe zimanê rojeva jiyana gelên bindest ên ne Fars. Aliyê herî girîng di vê pêwendiyê de berxwedana gel e. Dayîka Kurd dide xuyakirinê ku sîstema dewlet-neteweya bê bingehe a Îranî, sîstemeke bihanî ye ji gelê me re, lewma gel bi îradeyêke bihêz li hember vê sîstemê de berxwe daye û serbarê vê hindê ku xwîn û bihayêke zêde daye, lê teslîmê îradeya bihanî nebûye û rê nedaye ku sîstema zordariyê bi merema tunekirin û bişavtina nasnameya neteweyî di Kurdiştanê de serkeve. Di vê mijarê de em hewil didin ku îdiayên xwe yên jor de hatî bi awayêke berfiretir û zaniştî şirove bikin.

Yekem, piroje yan sîstema dewlet-neteweyî



Her weke ku heya niha hatiye gotin, peydabûna sîstema dewlet-netewe, piştî serhildana mezin a Firansayê kete rojevê. Di vê serhildanê de niştêcihên çarçoveya cografîyayî ya Firansayê li çarçoveya welatîyên paşatî û text û tacan derbas bûn û bi awayekî berfirehtir bûn welatîyên welatekê û şûnasa neteweyî girtin. Her di vî serdemî de bû ku têgeha netewexwazî (milîgerayî) bû bizavekî xelkî û bi çêbûna ala, sirûdên neteweyî, wêje, helbest, rê û resm û cejnên pirr reng ên neteweyî heşt û coşekî din di nava xelkê de dihat dîtin. Ev heşt û coş jî berî wê hindê ku di dîtingehê siyasî ve were mêzekirin, pitir ji çavkaniya heştên neteweyî û bilinragirtina buha û nîrxên neteweyî dihatin pênasekirin. Di vê derheqê de “Maks Wêbêr”, netewe bi komek ji xwestek, hezkirin û hêvi-

yan şirove dike ku xwe di çarçoveya dewleteka dîlxwaz û hêjayî xwe de dibînin. Herwiha “Êrnêst Gîlnêr”, bingehe çandî hegera pêkhtina neteweyan dide zanîn û dibêje ku hewceye yan faktera çandî ya hevbeş hebe yan jî divêt ku rêberên pêvajoya netewexweziyê hewil bidin çandêke nû peyda bikin û bikin bingeha raçandina xîmê neteweyekê. “Êrnêst Gîlnêr”, jî li ser vê baweriyê ye ku netewe wê demê wateyê werdigire ku bibe xwedî dewlet. Lêbelê ji bo ku di navbera tex û qatên civakê de yekîti çêbe û bike netewe, hizrên cuda hene. Bi berhevdana van hemû hizrên cuda raştîya han eyan dibe ku fakterên weke zimanê hevbeş, regez û qewmîyeta hevbeş, çanda yekgirtî û deb û edet, dîrok, hezkirina ax û welatekî hevbeş, berjewendî û armancên hevbeş bibe hebin ku binêşeya neteweyî were raçandin û neteweyek were afirandin.

Heke em li gor vê şiroveyê mezêyî mijarê bikin, ti yek ji hevbeşiyên han di navbera wan neteweyan de çinînin yên ku deştîlata Rîza Şah û heya heya îro jî rejîma Îslamî ya Îranê û herwiha netewexwazên Fars, hewil didin li gor wan hevbeşiyên, neteweya Îranî çêkin û dewleteke neteweyî jê re damezirînin. Lewma jî ticar gelên din ên Îranê ew dewlet hejayî xwe nezanîne û teslîsê wê nebûne. Duhem, pisra ziman û zimanê neteweyî Li gor şiroveyên cur bi cur li dor pîrsa ziman, zimanê zikmakî yek ji fakterên herî bihêz tê hesibandin di peydabûn û biçimgirtina şûnasa mirov de û yek ji hegerên sereke di pêşveçûn û geşekirina civaka mirovahiyê de ye. Her wek tê gotin şûnasa mirov ji take kes ve deştêpê dike û di aştê herî bilind wate şûnasa neteweyî de wateya xwe werdigire. Lewma ziman û nemaze zimanê zikmakî di vê qadê de pitir rol digêre û li gor bawerîya pisporan û yek ji wan “Roland Bêrton”, mirovnasê Firansayî, yekîtiya ziman

garantiya yekîtiya siyasî û derûnî ye û bi bawerîya wê geşekirina hizra neteweyî û dewletan di her cihekê de berhema yekîtiya ziman e. Ji bo derketina rol û girîngiya ziman di pîrsa şûnasxwaziya neteweyî de, hewce ye were gotin ku têkiliyên çandî weke zimanê hevbeş, wêjeya hevbeş û hwd..., têkiliyên rohî di navbera niştêcihên welat yan herêmeke diyar a cografîyayî de cêdikin, reng û rûyêke siyasî û neteweyî didin wan û dibin sedem ku taybetmendiyên cuda tevî niştêcihên welat yan herêmên din wergirin. Hebvbeşbûn di ol, ziman, derbasbûya siyasî, hizir û nêrinên civakî, niştîman a siyasî, kevneşopî û...hwd, de ye ku wateyêke serrast didin netewe û nasnameyêke neteweyî ji meriv re çêdikin. Li gor vê şiroveyê jî dîsan çî faktereke hevbeş di navbera zimanê neteweyên Îranê de nahê xuyakirin ku hemûyan li ser hev bixe û bibe bingeha peyadabûn yan çêkirina neteweya Îranê ku zimanê Farsî bibe zimanê wê yê neteweyî. Ji bilî vê çendê ku dide eşkerekirin ku pirojeya dewlet-neteweya Îranê û sepandina zimanê Farsî weke zimanê neteweyî, sîstemeke zordariyê ye ku berhema serkevîna wê, tenê tinekirin û bişavtina neteweyên din ên cîranên Farsan e di vê herêma cografîyayî de. Lewma her di deştêpêkê de ber bi rûyê berxwedana gelên herêmê bûye û heya niha jî serbarê kuştin, qirkirin, talan û vêrankirina niştîmana neteweyên vê herêmê, hêj ti serkevînek bi deşt xwe ve nexiştîye.

Her weke ku em dibînin dayîka Kurd bi eşkere şivika xwe li hizrên dewlet-netewexwazên Fars û Îranî radikêşe û haydariyê dide ku êdî hewce ye dev ji hizrên xwe yên pawanxwaziye û vê pirojeya xwe ya şikeştwarî berdî û di hizra peydakirina sîstemekê li gor moralên mirovahiyê de bin, da ku bikarin di kêleka neteweyên din ên herêm û cîhanê de bi rûmet bijîn.

Celadet Bedirxan xizmeteke bêhempa pêşkêşî zimanê Kurdî kir

Zimanzan û nivîskar û Çêkerê alfabeya kurdî ya bi latînî Mîr Celadet Alî Bedirxan ku di hemû waran de xizmeteke bêhempa pêşkêşî ziman û çand û edebiyata Kurdî kiriye, roja 15ê Tîrmeha sala 1951ê ji dinyaya me bar kir.

Zimanzan û filozofê Kurd Celadet Alî Bedirxan ku 26ê Nîsana 1893an li Stenbolê ji dayik bûbû, roja 15ê Tîrmeha 1951an, li Şama paytexta Sûriyê koça dawî kir.

Celadet di hemû waran de xizmeteke bêhempa pêşkêşî ziman û çand û edebiyata Kurdî kir.

Zimanzan û filozofê Kurd Celadet Alî Bedirxan ku nîsana sala 1893an li Stenbolê hate ser rûyê dinyayê, di hemû qad û waran de kedeke mezin û bêwêne pêşkêşî ziman û çanda Kurdî kir.

Xwediyê Kovara Hawarê Celadet Bedirxan bi taybetî di warê zimanê Kurdî de xwedî kedeke mezin û bandoreke berçav e. Celadet hergav doz li keç û lawên Kurd dikir ku xwe fêrî xwendin û nivîsan-



dina zimanê xwe bikin û wiha digot: “Divê em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Yan hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin an nebêjin em Kurd in. Bê ziman Kurdîtî ji we re ne rûmet, lê rûreşîyeke giran e.”

Celadet Bedirxan yekîtiya milletê Kurd di yekîtiya zimanê wî de didît û bi zîrekî û dûrbîniya xwe gihiştibû wê baweriyê ku divê berî her tiştî Kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û giringiyê pê bidin û wiha dibêje: “Şerma mezin ew e ku mirov nezanê xwendin û nivîsandina zimanê xwe be. Tenê bi hebûna xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe û paraştina wî, em dikarin di civata miletan de wek miletekî xweser bijîn û payedar bin.”

Piştî ked û xebateke bêrawestan, zimanzan û ronakbîrê Kurd ê qedirgiran Mîr Celadet Bedirxan di 15ê tîrmeha sala 1951ê de, li gundê Hecanê li nêzikî Şamê, di bîra qederê de wer bû û çû ser dîlovaniya Xwedê.

Jineke Qamişloyî mala xwe kiriye muzexaneyê folklorê Kurdî

Husniya Osman jineke temen 50 salî ye li gundê Maşûqê ser bi Qamişloyê dijî. Xewna wê ji zaroktiyê ve ew bû, ku di warê folklor û kelepore de bixwîne, lê rewşê rê nedayê û zû dibistan bicîh hişt.

Lê Husniya di hewildana cîbicîkirina xewna xwe de her berdeyam bû, di sala 2006ê de bi sedên parçeyên şûnwarî û kelûpelên folklorî kom kirin, ku dîroka herî kevnar a Rojavayê Kurdistanê lixwe digirin.

Akinciya Qamişlo Husniya Osman dibêje: “Min di zarokatiya xwe de dixwest ez li ser folklorê bixwînim, lê nebû miradê min. Ji sala 2006ê ve min dest bi vî karî kiriye. Ji min re jî bû defet ku xelk dema diçûn kelûpelên-



we li pey xwe diavêtin. Min jî ew berhev kirin.”

Di dema serdankirina wê de bo çend welatên Ewropî, Husniya ecêbmayî ma ku çawa ew welat folklor û kelepore xwe diparêzin, lewra biryar da ew jî heman tiştî bike, û nehêle kelepore neteweya wê bê jibîrkirin. Kevnartirîn parçeyê muzexaneyê mala Husniya mertalek e, bi gotina wê temenê wî 500 sal e.

Husniya kelûpelên gundên nêzikî gundê xwe û yên hinek gundên Bakur û Başûrê Kurdistanê jî kom kirine, û hinek ji wan jî ji xelkê kirîne. Hijmareke kuwîz ku nikaribû wan peyda bike, bideştê xwe hevawayê yên kevnar çêkirine. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Du hepsiyên siyasî ên Kurd di girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê de hatine îdamkirin

Roja Sêşemî 24ê Tîrmehê, du hepsiyên siyasî yên Kurd yên bi navên “Sabir Şêx Ebdulah û Diyako Resûlzade” xelkê bajarê Mihabadê, di girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê de hatine îdamkirin.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar di girtîgeha bajarê Urmîyê de, cezayê îdamkirina wan du hepsiyên siyasî ên Kurd, bi amadebûna 13 malbatên xwedî kuştî yên teqîna bombeya Xermanan a sala 1389an a Rojî, hate cîbicîkirin.

Roja Duşemî 23ê Tîrmehê, du hepsiyên siyasî ên Kurd yên mehkûm bi îdamê di benda 1-2 a girtîgeha bajarê Urmîyê de bo odeya takekesî hatibûne veguhestin.

Îdamkirina wan du hepsiyên Kurd di demekê de bûye ku Saziya Lêbûrîn a Navnetewî di daxuyaniyekê de ragihandibû ku dibê berpirsên hikûmeta Îranê dest bi cî bernamêya cîbicîkirina îdamkirina “Sabir Şêx Ebdulah û Diyako Resûlzade” bisekîne. “Sabir Şêx Ebdulah”, kurê “Mîstefa” û xwendekarê berê yê Karnasiya Bilind a Zanîngeha “Elameya Yeksanî” a bajarê Tehranê û digel “Diyako Resûlzade” ji sala 1392an ve di girtîgehê de bûn û piştî retkirina cezaya îdama wan di dîwana bilind a welat de, sala 1396an bo carekî din di taya yek a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê de bi serokayetiya dadwer “Çabuk” bi tohmata “encamdana teqîneveyê” û “endamê yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hikûmeta Îranê” bi îdamê hatibûne cezadan. Cezaya îdamkirina wan du hepsiyên siyasî piştî ku ji aliyê taya yek a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê ve bi ser wan de hatibû sepandin, di dîwana bilind a welat de hatibû piştraştirin.

Cezaya îdama “Husên Osmanî” yekî din yê hevdosiyeyê wan du hepsiyên mehkûm bi îdamê, di dîwana bilind a welat de hatibû retkirin û piştî ji aliyê taya yek a dadgeha şoreş a bajarê Mihabadê ve bi sê sal hepsa teizîrî û dûrxistin bo girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê hatibû cîbicîkirin.

“Sabir Şêx Ebdulah, Husên Osmanî û Diyako Resûlzade”, di meha Reşeme ya sala 1392an ji aliyê hêzên kincşexsî yên îdareya îtilaat a bajarê Mihabadê ve hatibûne binçavkirin.

Ew sê welatîyên Kurd, di naverasta meha Reşeme ya sala 1393an, di taya yek a dadgeha şoreş a bajarê Mihabadê de, bi serokayetiya dadwer “Ehmed Cewadîkiya” bi tohmata “encamdana teqîneveyê” û “endamê yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hikûmeta Îranê” bi îdamê hatibûne cezadan.

Wezareta Îtilaata hikûmeta Îslamî a Îranê di meha Banemer a sala 1393an de, ew sê welatîyên Kurd bi encamdana teqîneveya dawîya meha Xezelwer a sala 1389an di bajarê Mihabadê de û endamê yek ji Partiyên Kurd, tohmetbar kiribû. Berê jî, yek ji hevalê xwendekar yê “Sabir Şêx Ebdulah” bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandibû: “Dosiya Sabir Şêx Ebdulah kevtê bin destê Wezîrê Îtilaatê û bi yekcarî bû qurbaniyê wê navenda ewlehî a hikûmeta Îslamî ya Îranê, eve jî di demekê de ye ku Sabir agehdarê wê teqînê nebûye.

Berê, malbata wan sê welatîyên Kurd yên xelkê bajarê Mihabadê ragihandibûn ku kurên wan di heyama binçavkirina de li girtîgeha Wezareta Îtilaatê, bi merema vergirtina “îtirafa telvîzyonî” bi awayekî dijwar ew rastî îşkenceyê anîne.

Ji qedera 6 welatîyên Kurd ti zanyariyak ji ber dest de nîne

Şeş welatîyên Kurd yên xelkê bajarê Mihabadê, bi navên “Cesîm Mecnûnî, Esed Mihemednijad, Soran Nesîrî, Soran Muxtarîfer, Rêbwer Padeşt û Umîd Ebasî”, piştî binçavkirinê qedera wan nexuya ye.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, tevî lipeyketina malbata wan şeş welatîyên binçavkirî yên Kurd bo agehdarbûn ji qedera wan, hêzên ewlehî ti bersivêkî zelal di vê pêwendiyê de, nedane malbatên wan.

Çavkaniya agehdar got: “Ew şeş welatîyên ku hatine binçavkirin, li girtîgeha navendî ya ewlehiyê di bin lêkolînê de ne û ji sedema binçavkirina wan ti zanyariyak ji ber dest nîne.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Ew şeş welatîyên Kurd di heyama binçavkirinê de, ji pêragihîştin bi parêzer û çavpêketin digel malbatên xwe hatine bêparkirin.

Roja Çarşemî 11`ê Tîrmeha 2020 an, “Cesîm Mecnûnî” xelkê gundê “Qeredax” û rûniştîyê bajarê Mihabadê, “Esed Mihemednijad” xelkê taxa “Pişttep” a ser bi bajarê Mihabadê “Soran Nesîrî” xelkê bajarê “Gugtepe” a ser bi bajarê Mihabadê “Soran Muxtarîfer” xelkê gundê “Hacîxoş” a ser bi bajarê Mihabadê û “Umîd Ebasî” xelkê gundê “Îndirqaş” a ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Herwisa roja Pêncşemî 12`ê Tîrmehê, “Rêbwer Padeşt” kurê “Resûl” xelkê bajarê “Gugtepe” a ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (378)

Rêbaza Dr. Qasimlo, xwendengehek berdewam



Rêbaza Qasimlo xwendengeheke berdewam



Dezgeha Ragihandina Giştî a PDKî